

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Xebat ji bo* :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar ( 118 )* *Sal 21* *Rêbendan û Reşmeh* *2016z - 2627k* *Buha (50)L.S*


## Pênc sala..! ..... Gelê Sûryê Westiya..!

**Rozad Elî / Desteya sernivîser**



Li panzdê miha Avdarê, pênc sal di ser serhildana gelê Sûryê re derbas dibin.

Ji destpêka tevgerana^hîrak gelê Sûryê de li 15/3/2011ê, destlatê û paşê jî xudî pirojeyên Îslama Siyasiya kevneşop, raperîna gelêrî a azadixwaz û rewa ji riya wê ya durust derxistin û bi ser tevlehevî û pûçkirinê de ajotin.

Ji aliyekî de, sazûmanê xwast serhildanê ji riya wê ya aştiyane derxe û bike tevgereke çakdar, daku jê re bibr rêdaneke zagonî ku wê bi darê zorê vemrîne.

Ji aliyê din de, hêzên Îslama siyasî ên kevneşop jî, li gel komên tundrew û rêxistinên têrora cîhanî, xwastin berê serhildanê biguhêrin û bi ser pirojeyên xwe yên taybet bajon.

Mixabin, ew her du alî, sazûman û islamên tundrerw jî, di wan pêlanên xwe yên li dijî berjewendiya gelê Sûryê yê aştî û azadîxwaz de bi serketin, û sûrye, wek gel û welat, xistin nava babelatekek pir mezin û hêvî û armnacên serhildêran ta radeke bilind têk birin û Sûryê jî wêran kirin. ………..... ❷

## Pakrewanên Hovîtiyê Leşkerên Tirk

Li hêvara roja pêncşemê 18 meha Reşemehê, gelek gund û bajarokên li ber sînorê Tirkiyê û navenda bajarê Efrînê bi xwe jî toşî topbareneke leşkerên Komara Tirkiyê(K.T) û Cebhet El Nusra bûn. Piraniya topan li nav û li derdora gundan ketin, hinek jî li nava bajarê Efrînê ketin. Di encama wê topbaranê de, du kesan jiyana xwe ji dest da û bûn pakrewan, û çend welatiyên din jî birîndar bûn. Her du pakrewan ev bûn: Ceylan Nebo ji gundê Şêxorzê 17 salî, û Mihemed Seydo ji gundê Avrazê 34 salî bû. Ew her du jî niştecihên ……. ❽

## Şêx Meqsûd, Taxa Berxwedanê

Ji bêtirî du mehan de şerekî dijwar li taxa Kurda Şêx Meqsûd ku li Bakurê Helebê dibe. Piraniya şêniyê taxê Kurdên Efrînê ne. Berî ku şerê Sûryê ê navxweyî dest pê bike, bêtirî du sed hezar ji kurdên Efrînê û sed hezar ji kurdên Kobanê û gundê derdora Helebê lê dijîn. Ji bilî ku bi deh hezaran Ereb, file, Ermen û tirkman jî li gel hev pir bi hêminî û biratî bi hev re dijiyan.

Lê roja îro guhertineke bingehîn di warê niştecihiya taxê de çêbûye. Hejmara niştecihên wê pir kêm bûye. Li gora serhejmarên …….. ❽

# ROL Û DERFETA KURDAN

Nazdar Hesen

Di dîroka Rojhilata Navîn de, pir bûyerên girîng çêbûne, di van bûyeran de rola me kurdan jî roleke balkêş bû, çi di şoreşan, serhildan û avakirina dewletan de. Lê mixabin, li dawiyê, gelê kurd bê encam ma, heya bê mafekî biçûk jî ji meydanê derdiket û pir peymanên navdewletî li dijî mafên wî û çêkirina kurdistanê hatin holê.

A niha jî, rewşa Kurdan di şoreşa Suriyê de, roj bi roj balkêş dibe û bi roleke girîng radibe, çi di parastin, rêveberî û kontirolkirina herêmên xwe de û li ser qada Suriyê jî Kurd bûne hêzeke sereke û rewa. Lewra em dikarin bêjin, ku eger baş sûde jê were girtin, ev rewş ji gelê Kurd re dibe derfeteke zêrîn. Ew jî stubariyeke ji stubariyên tevgera



siyasî ya kurdî ye. Lewra jî divê haya me ji dijmin û neyaran hebe, divê em yekrêz bin, ….. ⓫

## Pênc sala ... Dûmahîk

Di van pênc salan de ji qeyran Sûryê, bûyer û guhertinên pir mezin di hemî war û rewşên gel û dewleta Sûryê, û di helwestên raya cîhanî de jî çêbûn.

Ji aliyekî de, dora 275 hezar mirovên Sûrî hatin kuştin, bêtirî milyonekî birîndar bû û bêtirî nîvê gelê Sûryê bû aware û penaber.

ji aliyê din de, aboriya Sûryê, çi çandin û çi pêşezaz bi tevahî têk çûn, binyata bingehîn wêran bû, gelek gund bajar jî wêran bûn, bi hezaran dibistan hatin hilweşandin û nifşek ji zarokan pênc salan ji xwendin û perwerdê bêpar man.

Lê ya ji wan girantir û xirabtir ew e, ku civaka Sûryê ji her aliyekî de bi diwarî birîn, tîşên kûr lê vebûn û gihîştiye ber kendalê jihevşelandinê. Û ew serhildana hêvî pê hebû, ku hemî pêkhateyên olî, nijadî, çandeyî, navçeyî yên Sûryê ji hev ve nêzîk bike û bike yek, ew tevgerana aştiyane teqle bû û bû şerekî navxweyî î pir dijawr û fere, cudatiyên xedar xistin navbera wan û hêviyên mirovê Sûrî li ber têwerdana destên ji derv û hovîtiya têrostan şewitîn, û bi kiryayrên hovane yên artêşa sazûmanê jiyana xwe ji dest dan.

Roja îro, eger şer berdewam bike, sê rê li ber şerê navxweyî li Sûryê hene; yek: Hêzên Îslama teundrew li gel rêxistinên têrora cîhanî ku aligirên wan in, bi serkevin; didu: Sazûman bi serkeve; sisê: Şerê navxweyî berdewam bibe û Sûryê jî bibe mîna Somal û Avxanistanê. Ew her sê rêvebjar jî, ji aliyê civaka navdewletî de ne tên pejrandin. Ji ber ku Sûryê bi xaknîgariya xwe Siyasî ne mîna Somal û Avxanistnê ye, ew berrsînora wê Îsraîl, Yekîtiya Ewrupa û Hevpeymana NATO ye, ji bilî ku di nava kanên pitrol û xazê jî de ye.

Ji ber van sedemên sereke û sedemine din jî, ji bilî riya çareseriya tu rê li pêş sazûmana sûrî û alîgirên, û rikberê û aligirên wî jî ne gengaz e, biryara 2254 ya Encûmene Ewlehî Navnetewî ye ku li derbara qeyran Sûryê ku bi tevahiya dengên endamên hate standin di wê çarçewêde hatiye, û civînê Cinêvê jî wê li wê werin girêdan. Xalên biryarê yên bingehîn jî ev bûn:

1- Şer li Sûryê were rawstandin.

2- Rêxistinên têrorîst, mîna Daiş û Nusra ji holê werin rakirin.

3- Dewletên herêmê mîna Tirkiyê û Si`ûdiyê ji çareseriyê re bibin alîkar.

4- Destlateke hevbeş li şûna sazûmana ku niha destlatdar e were avakirin.

5- Destûrekî nû ji Sûryê were danîn, tê de mafên rewa yên hemî pêkhateyên gelê Sûryê were diyar kirin, û ew hemî bi hev re û mîna hev di dewlet û destlata Sûryê bibin dehevpar.

Gelê Sûryê li benda roniya dawiya tunêlê ye û girêka qeyrana wî rojekê pêşde were şelandin û xwîna ku her gavê tê rijandin rawest e. Çinkî roja îro, her welatiyekî Sûrî û berketiyên wî bi dengê bilind diqîrin û bang dikin: Bes e kuştin û wêrankirin…! **Gelê Sûryê westiya!.**


# BILA CÎHAN TEV ZANIBE

**Memê Alan**

Gelê Kurd ji berî zayînê de bi sê hezar sal tamar û rehên xwe di xaka Mezopotamya ya ku dikeve îlika Rojhilata Navîn (R.N)de berdane, û navê wê xaka pîroz jî Kurdistan e. Ew xwedî dîrokeke dirêj dewlemend, çandeke taybet, zimanekî şêrîn û jîndar, siruşteke xweşik û rengîn, û serxak û binaxeke zêrîn e, herweha ew bi roleke berçav û balkêş di pêvajoya şaristaniya vê herêmê de lîstiye, û mora bandora wê ta vê kêlîkê li hemî çarçewa (R.N) ji kesên kûr re jî diyar e. Lê mixabin, zengîniya xaka Kurdistanê û qehremaniya xelkê wê, hîştine ku dijmin li derdorê pir bibin û pêlanên qirêj li dijî wê ji aliyê cîranan ve û hin caran bi alîkariya hêzên setemkar ên navdewletî de tev bigerin, da ku bin pê û lawaz bikin, biçewsînin û perç perçe bikin.

Cara yekê, dema ku bapîrên Kurdan Gelê Gotî- berî ( 3100)B.Z dijiya, (AŞÛRIYAN) êrişeke xwînî bi ser de birin û welatê wî KURDISTAN ji çiyayên ARARATÊ de bigir û ta deşta (RUHAYÊ) di goleke xwînê de hîştin. Lê li sala/612/B.Z gelê MÎDÎ- neviyên Gotiyan- kanîbû kişwera Aşûriyan birûxandana û tola bav û bapîrên xwe hilda .

Di sedsala heftemîn zayînî de, yanê sala(640)î ya zayînî de, bûyereke xwînî ye din di kurdi-




“ Ji malpera Elmewso´a Elerebiyê - من موقع الموسوعة العربية “

stanê de pêkhat. Ew jî rûbirûbûna Kurdan li heber artêşên misilman di dema Umer Ibin El-xetab de bû. Û weha Kurdistan derbas asteke nû di hemî waran de bû.

Di sedsala yazdan a zayînî de, çivek din girîng di dîroka Kurdan de çêbû. Ew jî rûbirûbûna kurdan di nîvê diwem ji wê sedsalê de bi TURKÊN OXOZ ên ji Asiya Navîn hatine re bû, di wê bûyerê de jî, Kurdistan ket gola xwînê û guherîneke mezin hate holê.

Di sedsalên sêzdehan û çardehan de jî, gelek bûyer û guherînên mezin bi ser Kurdan û welatê wan de hatin, lê vê carê berxwedana gelê kurd li hember êriş û talankirinên (MEXOL û TEYMORIYAN) bû, û encamên wan şer û pevçûnan bûn .

Lê, bûyerên ku di çarêka yekê ji sedsala şazdehan de bi ser kurdistanê de pêkhatibûn, hîn berztir bûn .ÎMPERETORIYA OSMANÎ perçakî mezin ji Kurdistanê zeft kir, paşê li sala 1514an şerê ÇALDÎRANÊ di navbera ÎMPERETORIYA OSMANÎ û ÎMPERETORIYA SEFEWÎ de li ser xaka welatê Kurdan pêkhat û weha berdewam kir, ta ku li sala 1639an, di peymana QESIR ŞÊRÎN a fermî di navêna OSMANIYAN û FARISAN de, Kurdistan cara yekê di nav xwe de dabeş û perçe kirin.

Û di çarêka yekê de ji sedsala nozdehan, beşê KURDISTANÊ yê di bin destê FARISAN de, û di encama şerê wê bi RÛSIYA QEYSERÎ re, bû du beş, û rûsiya perçê Bakur-Rojavayê wî beşî kir bin destê xwe, û piştî şerê cîhanê yê yekê di hevpeymana SEYKÊS –BÎKO de, ….. ❹

# Cinêv-3 Ne ya Dawî ye

Merwan Berekat



Sîvir, Lozan û niha jî Cinêv sisê û hîn jî, mejiyê Kurdan ji ( ez.. û ne tu ) rizgar nebûye. Di Sîvira 1920an de, Kurd amade kirin, lê wek çavdêr û tenê di gengeşekirina xalên ku li ser Kurdan de bûn. Di 1923an de, li Lozanê jî hinek bi navê Kurdan hebûn, lê benda (62)an di hevpeymana Sîvirê de ku mafê gelê Kurd destnîşan kiribû, wan bi çend berîk zêr firotin.

Berî Cinêv sisê were lidarxistin mejiyê Kurdan ê (ez … ne tu) geş bû, û li ser ekranên T.V an germ bû. Yên ku dibêjin Kurd terorîst in, di bin simêlan re keniyan, û yên ku ta berî çend salan rûçikên rêjîma Elbe`s bûn barê wan sivik bû.

Piştî ku hespên Osmaniyan cirîda serkeftina daxweza Sultên li Cezîra Botan kirin, nema gotina: (Te çima wisa kir…. lo Ezidîn Şêr) sûde nekir. Ma gelo derewa Sulatan Mûrad (Pêxember nifir li Kurdan kiriye ji bo nebin yek) bûye rastî?!

Bêguman ev ne Cinêva dawiyê ye, lê xwezî (ez .. ne tu) ya Kurdan ya dawî be, Kirêmlên, Kongrês û yên di navbera wan de, ne berketiyê me ne... na, tenê berjewendî ji bo wan pîvan e, eger em ne haydar û ne li hev bin, dawî biderdan û ji destdan e.



Dem zû tê bostkirin, de ka em qada Çarçira bi bîr bînin… pirs mezin in: Çima li me wisa kirin? Piştî îmza reş li paytexta Cezaîr, bersiva Kîsincer (*Berjewendiya gelê Emrîkî berî her tiştekî ye*) bû. Ma yên ku li kolanên Amed, Silopî, Nisêbîn….. bi gule û qurşînên dewleta Tirk tên kuştin ew ne mirov in? Çima serpereştên Cinivê bêdeng in??!

Lome welatan ava nakin, lehiyên herimî zû zelal nabin û dîrok bi ( ez .. ne tu) çênabe. Hîn demê bernavêtiye û mejiyê Kurdan ne tim stewr e, ya rast û serkeftin ew e, ku em (ez … ne tu) bi ( ez û tu) biguhêrin. Ji ber ku ne dawî ye, hîn Cinêv dê pir bin.

---

**Bila cîhan … Dûmahîk**

beşê din ê di bin destlata ÎMPERETORIYA OSMANÎ de bû sê perçe. Beşek ji wî perçî bi dewleta Turkiyê ve bû, beşê dudiyê bi dewleta ÎRAQÊ ya di bin destê ÎNGILÎZ de bû hate girêdan, û beşê sisiyê kete nav sînorê SÛRIYÊ ya ku wê hinge di bin destlatiya FIRNSE de bû, û ta roja îro rewşa Kurdistanê û gelê Kurd weha perçekirî û bê maf didome, lê destlatên zeftkar (ÎRAN, TURKIYÊ, ÎRAQ û SÛRIYÊ) bi wê tenê jî nekirin, hertim zulim û zor li serê gelê Kurd meşandin, kuştin ,zîndan û îşkencekirin, bi darvekirin, ziman û kultûra wan qedexe kirin û bi her awî hewildan kirin da ku kurdan pipişêfin, tune bikin û li dawiyê wan bikin Turk, Ereb û Faris. Û berdewam jî li ser jiholêrakirina gelê Kurd hevgir û hevkar bûn. Ne bes weha jî, hêzên navdewletî jî di berjewendiyên xwe bi Turk, Ereb, û Farisan re nediborîn, wêlomê jî çavên xwe li ser kiryarên wan bi kurdan re dadimarandin û xwe ker dikirin. Lê, li dirêjiya sedsala bîstan gelê Kurd li her çar perçên Kurdistanê li hember wan kiyarên kirêt ranewestî û çav nemexelandin, berevanî bi her awî kir û fedekariyên bêsînor li ser riya xebatê di ber ax û mafên xwe yên çarenûsî de dan, û ta vê kêlîkê berdewam e.

Vêca bila cîhan tev û bitaybetî TURKIYÊ , ÎRAN, ÎRAQ û SÛRIYÊ zanibin ku gelê Kurd çi li Bakur, Başûr, Rojhilat û çi jî li Rojavayê Kurdistanê nema radiweste, amade ye qehremaniyek bê sînor ji ber ax û çarenûsa xwe ve bike, û tucarî dev ji maf û welatê xwe bernade. Herweha bila bizanibin, ku aramî, aştî û çarenûsa dewletên zeftkar ji Kurdistanê re bi taybetî û ya R.N. bi tevayî di metirsiyê de ye, ger rewşa gelê Kurd bê çareserî bimîne û Kurd di çarserkirinên siyasî de ne hevpar bin.

Çareseriya siyasî ya aştiyane ji qeyrana sûriyê re, û Cinefa sisiyê jî nimûne ye. Ger şandeke kurdî lê beşdar nebe, wê kulek bimîne û kirîz jî çarser nabe.

# Rêveberiya xweser ... Çima û ji bo çi ye?

**Dildar Qamişlokî**

Piştî ku rêjîma leşker û hêzên xwe yên ewlekariyê ji gelek bajar û herêmên kurdî vekişanadin, valahiyeke ewleyî çêkir, herweha ro bi ro pir valayî di warê rêveberî de jî çi bi vîna xwe, çi ne bi vîna xwe çêdikir, hin Kar û bar, pêdiviyên jiyana rojane yên kes û xelkên van deveran dihatin rawestan, metirsî li ser can û malûmewdan dihatin holê, van tiştan tevan, ji bo zagon û yasakirina jiyana civakê, pêwîstiya damezrandina rêveberiyekê anîn.

Programa partiya me ya rêzanî jî -ya ku kurte encama çanda hevala ye- ji kongira giştî ya partiyê ya pêncan ve ``rêveberiya xweser`` wek çareserî ji rewşa kurdî li sûriyê re dibîne, û di kongira heftemîn de careke din teqez bûye, herêmên kurdî tev bi hev re werin rêvebirin wek yekîtiyek rêveberî - siyasî û wek giringiyekê bi ser vê xalê ve bûye, lê belê me tu proje jê re amade ne kiriye. Herweha rêveberî xaleke sereke bû di rêkeftina (DIHOKÊ) de jî -ya ku hostayê wê sekirtêrê partiya me berêz (Mihidîn Şêx Alî) bû, bi erêkirin û serpereştiya serokê herêma kurdistanê rêzdar (Mesûd Berzanî)- û ji sê xalên bingehîn hatibû mor kirin. Di xalên rêkeftinê de xuya bû ku piştî rêveçûna (lêvegera siyasî) û damezrandina serkirdayeteke hevbeş ji hemî hêz û yekîneyên leşkerî yên layên Kurd re, pêwîst e hemî layên ku li ser rêkeftinê morkirine tevlî vê rêveberiya heye bibin, piştî lêvegerek li hemî belge û yasaya wê were kirin, kêmasî û şaşiyên wê werin çareserkirin, di civata fireh ya partiya me de jî, em bi danûstandina bi şêweyek erênî li gor xalên rêkeftina Dihokê bi vê rêveberiyê re bi biryar derketin.



Lê mixabin pîlan di (ENKS) de li partiya me û du partiyên din hatin kirin û ji encûmenê û hemû desteyên wê hatin dûrkirin, Encûmena mayî piştî ku para xwe di rêkeftinê de zêde kir jî, karê xwe di (lêvegera rêzanî) de sarkir û ew rêkeftin hate rawestandin. Mixabin hinek alî, kes û partiyên herêma Kurdistanê yên ku karîbûn roleke erênî bileyzin da ku ew rêkeftin berdewam bike û were geşkirin, rola wan ne baş bû, dest dirêjî jî di nav (ENKS) û partiyên wê de kirin, (ENKS) bi xwe jî qels û mişext kirin. Dema ku me tevan bi hev re rêkeftina (HEWLÊR, DIHOK) û lihevkirina navbera wan de mor kir, me dizanîbû ku riya me wê bi gulan e raxistî be, gelek xepek wê werin pêşiya me, di rewşeke weha de pir astengî û bêtar wê bikevin riya lihevkirinê, herweha me dizanîbû ku ne her tişt wek daxwaz û baweriyê me çi partî û çi jî encûmen wê were kirin, lê belê em bawer bûn bi giringiya yekrêziyê di her demê de, û bi taybetî di vê dema ku gelek hêzan berê xwe dane herêm û gelê me yê Kurd, bo dagîrkirina herêm û navçên wî û tunekirina hebûna wî. Ji hêla din ve, em bawerbûn ku her tişt, û pirsgirêk bi gotûbêjê çareser dibin. Bê guman tu dem, û rewş vê baweriya me qels nake û naguhere.

Tê zanîn ku armanca vê pîlana ku li partiya me hate kirin ew bû ku piroja wê ya rêzanî qels bikin, ne tenê ji hemî deste û komîteyan û dûrxin, belê ji hemî kar û xebata di pêşerojê de were kirin, û herweha ji kesên xwedî raman û serbixwe di nav gel de jî, çimkî ew kes piştgirê projeyek weha ne, daku partiya me bi tenê bimîne, bê çare bibe û serê xwe ji dubendîtiyê re bitewînê, bikeve bendeke ji bendên seranserî Kurdistanê, hevbeş be di nakokiya bendan de, çimkî ew bend naxwazin kesek an jî partiyek hebe ramana wî ji serê wî be û ne di bin siya wan de be, dixwazin her ew tenê hebin û di dawiyê de her tiştî li xwe parvekin.

Bo vê yekê û li ser roniya biryarên kongira me ya heftan û civata fireh, derbasbûna rêveberiyê di partiyê de hate gengeşe kirin, encama wê gengeşê ew bû ku pêdivî ji hin karên din re ye, ev ji hêlekê ve, ji hêla din ve derbasbûna partiyê bi tenê wê bikeve xizmeta dubendîtiyê, çimkî bivê nevê wê partiyê bixe hemberî hin partiyên (ENKS) û rû li rû di vê dema ku dubendî tê gurkirin de, hin şaşîtiyê ......

11

# Li derbarê " Panadol " û dermanan

Dr. Leheng Mihemed



Gava mirov li Cinêva sisiyan temaşe kir, ku çawa hin nûnerên xwe bi şêwekî lawaz û jihevketî hatin nîşankirin û bi erzanî li milet hate nêrîn, (çi ji aliyê opozisyona Turkiyê û Riyad ve, û çi ji alî rêjîma Sûriyê ve), xemsarî û nerazîbûn nîşanda. Di wê navberê de jî, gelek daxûyanî û gotinên çewt û bervajî di dermafê Kurdan de ji aliyê nûnerên temsîldar di Cinêvê de ji nav ortaqên me yên Ereb ên Sûrî hatin ragihandin, vê yekê hîşt nerazîbûna Kurdan were çespandin û xuyakirin ku çiqas bi çavekî biçûk û ne îjdil li Kurdên Sûriyê dinêrin .

Va ye nûnerê rêjîma Sûriyê li Cinêvê (Beşar El Ce`ferî) bê şerm û fedî henekên xwe dike, û bi her Kurdekî hêvîdar û mafxwaz re dibêje here Kurdo hebek Panadol bibe ku tu ji serêşiyên daxwazên xwe xelas bibî, bêyî piçek hurmet û rêzdarî ji miletê Kurd re bigire .

Li rex wî jî gelek nûnerên opozisyonê li vir û li wir Kurdan û daxwazên wan bin pê dikin û wan ji lênûs û hesaban derdixin û tu carî bi hêjayî li me wek miletekî hevbeş nanêrin .

Li hember van wêneyan piştî 5 salan ji (şoreşa) Sûriyê, mirov digîne encamine ku tu hêvî ji cîranên me yên Sûrî tune ne , ku doza miletê Kurd weke ku Kurd dixwazin çareser bikin û perdên baweriyê di navbera me de roj bi roj jîdidirînin. Li gel vê pêkhatiyên rêzanî, tiştên ku li ser zemînê dibin xûya dikin ku Kurd bi şervanên xwe, berwxedanek bi rêkûpêk bi pêşve dixin û gelek maf bi xwîna pakrewanan bi dest xwe tînin û wek hêzek bingehîn li hember hêzên tundrew ên ku wek teror ji hêla Encumena Ewlehî de hatine nasandin.

Li rex serkeftinên leşkerî, xweseriyek taybet bi destê Kurdan hatiye damezrandin. Pirsa girîng ew e ku çi ji Kurdan re bi sûd û girîng e , û çi ji me tê xwestin ?

Berî her tiştî ezmûna mezin li hember rêxistinên me yên siyasî yên sereke, ew e ku baş tê bigihên ku dermanê me di dest me de ye, û çiqas qezenc em li ser zemînê bi destê xwe pêk bînin, ewê di pêşerojê de ji me re bimîne, bi taybetî jî, weke xûya dibe ku rewşa Sûriyê tu carî di demek nêzîk de nayê çareserkirin. Di xizmet vê pêdiviyê de, hebûna tek gotareke Kurdî û avakirina şêweyek ji şêweyên yekîtiya nêrînan erkeke netewî û dîrokî ye, yanê divê nûnertiya siyasî ya Kurdên Sûriyê diyar be û yek be, û rev jî ji vê pêdiviyê şaşîtiyek bê derman e. Loma jî divê rojekê pêşde masa goftogoyê were vekirin û lihevkirinek were damezrandin.

Rêvebiriya xweser gerek e weke rêberiyeke Kurdî ji hemû Kurdên Sûriyê re lê were nêrîn û parastin, û pêşxistina wê weke stûbariyeke sereke were nîşankirin û hemo partiyên me tê de kar bikin û bi pêş ve bixin .

Şervanên YPG û YPJ yên hemû Kurdên Sûriyê ne û ne yên tek aliyekî ne, û di ber vê de divê ciwanên me bi razîbûn û berpirsayetî tevlî vê hêzê bibin ku bi erkên xweparastinê di demên girîng de rabin, ji ber em bawer dikin, ku hîn gelek metirsî li benda miletê me ne.

Li gel van pêdviyan, damezrandina civaka sîvîl û parastina dezgehên wê, ji bo pêşerojek erênî ji civaka Kurdî re, xwestekeke serke ye ji hemo aliyan ve, daku tecrûba Kurdan di Rojhilata Navîn de tecrûbek serkeftî be û nîşanek ji nîşanên jînbûna miletê Kurd be. Ev erka her partiyekê ye, û stûbariya mezin a rêvebiriya xweser de ye .

Em weke Kurdên Sûriyê gelek rojên çetin li benda me ne, lê weke me berê got, derman û çareserî bi dest kesên hişmend û bîrwer de ye, û eger bi parekî ji van pêdiviyên jorîn rabin, wê gelek şovenîst û xêrnexwaz bi hewceyî panadol û dermanan bibin .



# Avakirina Encumena Niştimanî ya Kurdî li Sûryê (Hevbendî)



Piştî danûtandineke dirêj û gelek karên hevbeş di navbera Partiyên Girseya Lêvegera Siyasî ya Kurdî de (P.G.L.S), ew her pênc partî bi hev re gihîştin wê baweriyê ku gerek e çarçeweke rêxistînî e hevbeş di navbera partiyên wan de were damezrînin, û pêwîst dîtin jî ku saziyên sîvîl û kesayetiyên niştimanperwer jî ciyê xwe di nava wê rêxistinê de bigirin û li gel endamên partiyan bi kar û xebata gelê xwe rabin û di va dema nazik û hestewar de erkên xwe hilgirin.

Li ser wê mebest û bingehê, li roja 12/2/2016an û bi amadebûna nûnerên partiyên P.G.L.S û nûnerên kesên niştmanperwer, saziyên sîvîl û hejmarek ji xebatakarên dêrîn, P.G.L.S kongira xwe li dar xist û damezrandina Encûmena Niştimanî Ya Kurdî li Sûryê(Hevbendî) ragihand. Di civîna destpêkê de, gelek nûnerên civak û partiyê siyasî yên hemî pêkhateyên herêmên kurdî, wek mîvan, lê amade bûn, mîna gelek kesayetiyên Ereb, Kurd û partiyên TEV-DEMê û bilî wan jî lê amade bûn.

Bi wê boneyê, û ji ber rewşa awarte ya çûnûhatinê di navbera Efrînê û Cizîrê de, rêzdar Mihyedîn Şêx Allî, Sekretêrê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê pîroznamek ji kongirê P.G.L.S şand, ew e deqa wê:

**PÎROZNAME**

**Ji kongira giştî ya damezrandina Hevbendiya Niştimanî ya Kurd li Sûriyê**

**Beşdarên birêz ….**

**Mîvan û endamên kongir ....**

**Ciwanik û camêrên hêja …..**

Lidarxistina kongirekî weha ku em jî beşekin jê, ciyê pîrozbahiya partiya me û beşekî ne biçûk ji xelkê me ye, ji ber ku, pêngaveke pêwîst û girîng e li ser riya berdewamiya hewildanên dilsoz, bona pêkanîna lihevkirin û xurtkirina yekrêziya gelê Kurd di qonaxeke weha zor nazik de, ku ji hemiyan re berçav û baş dixuyê, ku çendî metirsiyên hovîtiya şebekeyên terorê û çavsoriya şovenîzma rijîma Be`is di derheqê gelê me yê Kurd de li holê û aşkere ne. Ev kongira nûnertiya gelek partî, rûsipiyên civakê û rewşenbîran dike, digel rêzgitin û piştgiriya gelek dost û birayan.

Hevalino, li me biborin, ji ber rewş û piroblemên çûn û hatinê, û nebûna derfeta derbasbûna sînoran, me nikaribû xwe bighênin we.

Heval û hogirên partiya me li seranserî herêma Efrîn, taxên Helebê û deverên dî, we silav dikin û serkeftinê ji we re dixwazin.

Careke dî em we pîroz dikin û em bi dil û can li gel we ne, hêvî û bawerî ew e ku, biryarên kongir, dê di xizmet doza gelê me ya dadmend de bin.

*Serkeftin ji kongireya we re*

**Birayê we Mihidîn Şêx Allî**

## Danasîna Navên Xaknîgarî

**Çiyayê Hawar:**



Hawar çiyakî naskirî ye ji Çi.Kurmênc (Efrîn). Rêzdar Cemîl Kinê di pirtûka xwe / Zordariyên Firensiyan…/ de, navê wî bi şêweyê ”Çiyayê El-Ĥiwar” nivîsiye, em bawer dikin, ku wî şêweyê nivîsandina navê çiyê ji jêderên Erebî yên kevin biriye. Lê belê wekî ku nas e, cihên kevirên Ĥewarê li seranserî Çi.Hawarê netên dîtin, da em kani bin bêjin, ku çiya pê hatiye binavkirin.

Em bawer dikin, ku navê “Hawar” navekî Kurdî ye, ew di Kurdî de bi wateya bangînkirinê, gazîkirinê, alîkarîxwastinê… û H.W.D tê. Ew nav û wate jî, li bejna dijwariya kendûkorên Çi.Hawarê û daristaniya wî ya pir siq û dijwar tê.

Lê ne dûr e jî, ku têkliya navê Hawarê bi navê gelê Horî yê kevin re jî hebe. Jêderên Erebî navê Horiyan jî wek “Ĥorî” bi lêv dikin, û tîpa “H” bi “Ĥ” diguhêrin. Em dizanin jî ku, gelê Horî ji bapîrên miletê Kurd e.

……⓫

**Şêx Meqsûd … Dûmahîk**



nêzerast, hejmara Kurdan daketiye derdora pêncî hezarî, û bi deh hezaran kesên ji taxên Helebê yên din hatine tê de bi cih bûne. Ji bilî ku piranî, eger em nebêjin hemî, malên ku xudiyên wan jê derketin, hatine vekirin û talan bûne. Ta deriyên ode û xaniyan hatine hilkirin û dizîn.

Ji destpêka şerê Sûryê yê navxwe de, taxa Şêx Meqsûd ji aliyê Hêzên Parastina Gel ve tê parastin, serweriya xwe lê dikin û karûbarên niştecihên wê, çi Ereb û çi Kurd bi rêve dibin. Bi tevahî rewşa taxê ji taxên Helebê yên ku di bin destê rikberiyê de ne aramtir bû.

Lê ji du – sê mehan de, nemaze piştî ku Hêzên Sûrya Demokratî (H.S.D) li Bakurê Helebê li hember komên Îslamî ên tudnrew, mîna Cephet El Nusre û hemtayên wê, ku piştgiriyê ji aliyê Komara Tirkiyê (K.T) de dibînin, pêşde çûn, taxa Şêx Meqsûd toşî hêrişên dijwar dibe. Ji nêzîkî mehekê de hêzên El Nusra, Siltan Mûrad û bilî wan jî, diz û keleşên ku xwe kirine rikber û şoreşger, bi sedan bombe û kûzên teqîner bi ser kolan û malên taxê tê xwar. Û pevçûnê û hêrişên rojane bi parêzvanên taxê re ji H.S.D û sîvîlan de dibin. Di encama wê topbarandinê û wan hêrişan de, bi dehan ji niştecihên taxê û parêzvanan jiyan xwe ji dest dan û bûn pakrewan, bi sedan jî birînda ketin, û bi sedan malên xelkê wêran bûn û bi ser serê wan de hilweşîn.

Ji pêkola ku rayderên payebilind ên K.T ji bo guhertinên giring li Bakurê Helebê dibîne, dike, û topbarana ku bi ser navça Efrînê de tê, yekser diyar dibe ku destê K.T di paş rewşa taxa Şêx Meqsûd de ye, û ta bomberana bi xazên kîmawî jî perestvanên ``Gurêb Boz`` ji neviyên Alp Arslan Turkêş di ber de parpisyar in.


---

**Pakrewanên Hovîtiyê … Dûmahîk**

bajarê Efrînê ne.

Bi wê boneyê, sekeretêrê partiya Yekîtî mamoste Mihidîn Şêx Alî li gel şandekê ji serkirdeya pirtiyê, seredana malên wan pakrewanan kir, serê xwedî û malbata wan xweş kir. Di seredana xwe de, rêzdar Şêx Alî hêrişa artêşa Tirkiyê li ser gund û bajarên Kurdan li Roavayê Kurdistanê şermezar kir, û diyar kir ku armanca K.T ne dijîtiya têrorê dike, û ne berketiya pêkanîna mafê gelê Sûryê ye, derdê K.T ya her sereke pinpêkirina mafên gelê Kurd li her beşekî Kurdistanê û li her ciyekî ku Kurd lê dijîn e. Û dema ew dibînin ku doza gelê Kurd li Sûryê pêş dikeve, û Kurd hêzên xwe yên xweparastinê mîna ypg-ypj ava dikin, di qada têkoşîna li dijî têrorê de xwe mêlag[îsbat] dikin û li nava raya cîhanî jî cihekî payebilind digirin, rayedarên K.T hişê xwe wind dikin, bi karên wiha çepel radibin û sîvîlan dike armanc.

Bêguman karên wiha qirêj, çi ji aliyê K.T de û çi ji hêla keriyên têrorên ku K.T wan tîmar dike de, wê ne yên dawiyê bin. Çinkî dîroka wan di dijîtiya Kurdan û welatê wan de reş û xwînî ye, di têkbirin û beravêtina serhildana tevaya gelê Sûryê de û ji destpêka de rista[rola] wê ya durû hatiye naskirn. Roja îro û di



van rewşê nazik de û dijwar de, xweparastin û serketina gelê Kurd di xebata wan ya hişyar û di yekîtiya wî de ye, di piştgiriya Hêzên Parastina Gel de ye. Û çiqas xelkê me ji hev hez bike, li hev miqate be û ji Xweseriyê alîkar be, ewqas xweparastina me wê rast û durust be û emê kani bin ji vê qeyrana reş ku tevaya Rojhilata Navîn tê re derbas dibe serkeftî derkevin.

# Du Salveger û Çelrojiyek

Di navbera deh rojan de, sê boneyên watedar di ser navça Efrînê re derbas bûn. Ew her sê jî boneya şehîtketina hin hevalên me endamên Partiya Yekîtî bûn, ku bi qurşînên xinan û destên reş hatin kuştin û bûn qurbana doza gelê Kurd û gelê Sûryê.

### Pakrewan Kemal Henan:



Li roja 31/1/2016 dost, heval, meriv û malbata hevalê nemir Kemal Henan boneya koçkirina wî ya salvegera sêyem bi bîr anîn. Bi gul, çîçek û bi rêwresmeke hêja, li gora meqama pakrewan Kemal, mêvan, şêniyê gundê Tilifê û xwediyên nemir çûn ser gora wî. Li ber gorê, gotina partiya Yekîtî (Elwihdê) hat gotin, tê de li ser sincî, hevaltî û dilsozya wî ya payebilind hat dengkirin. Piştre, kurê nemir gotineke kurt kir, bixêrhatina mêvanên bavê xwe kir û ew spas kirin.

### Pakrewan Gulistan Hesen:



Li roja duşemê 8/2/2016 çel roj di ser pakrewanbûna hevala partiya Yekîtî xanim Gulistan Hesen re derbas bû. Bi sedan dost, heval û hogirên pakrewana me û malbata wê, li gel şandeke mezin ji rêvebirya Partiya Yekîtî li nava goristana Gundê Çolaqa li ber gora xanima nemir Gulistan civiyan. Hevalan bi rêwresmeke bi coş û li gora payebilndiya Heval Gulistan çelê pakrewanbûna wê li dar xistin. Çend gotin bi navê partiya wê (yekît) û bi navê malabata wê li ser sincî û kar û xebata wê hatin gotin. Piştre, beşdaran bi navê Partiya Yekîtî seredana konê pakrewanê YPG li gundê Çolaqa kir û sersaxî ji heval û malbata wî re, û gotinek bi navê partiya Yekîtî hat gotin.

### Dr.Şêrzad Hec Reşîd:



li roja 9/2/2016an çar sal di şehîdketina hevalê nemir, bijîşk Şêrzad Hec Reşît re derbas bûn. Bi wê boneyê girseyek ji dost û hevalên Partiya Yekîtî li gel meriv û şêniyê gundê Elemdara seredana gora wî li gund kirin. Hejmarek ji rêberiya Partiya Yekîtî jî di rêwresmê de beşdar bûn. Gotinek bi navê partiya nemir (partiya Yekîtî) hat gotin, tê de sincî û kar û xebata pakrewanê nemir hatin zimên û sozê berdewamiya xebatê ji bo mafên rewa yên gelê Kurd dubare bû.

## *Hunermendê me Kanî Alan Evîndarê Dara Zêtûnê*





Komîta Darizandinê[tehkîmê] ya Cîhanî, li roja 1/3/2016an encama pêşbirka cîhanî ya tabloya hunerî ya sala 2016an ragihand, û di encamê de hunermendê Kurd **Kanî Alan**, yek ji deh hunermendên rêza pêşîn di cîhanê de hate vebjartin, û wek hunermendê yekemîn li Rojhilata Nêzîk û Navîn jî hate nasandin.

Hunermend Kanî Alan ji hin malperên elêktronî re xuya kir û wiha got: Min ew nûça bi şêbûnek dilbirîn bihîst, ji ber ku ez ji hundirê xwe de hestewar im ku ez ji sêwîyên cîhanê me.. Çinkî hemî pêşbirkvan xudî nasname û welat bûn, yanê war û dewletên wan hebûn, lê ez .. Ez kî me? Kanî welatê min?

Hunermendê Cîhanî got: Li sala 2015an dîsa ez di nav deh hunermendên cîhanî ên pêşîn de hatim vebjartin û min bawernama serkeftina xwe diyarî zarokên Kurdistanê û cîhanê kir. Îsal jî ez wê serkeftinê diyarî jina Kurd a qehreman û ya cîhanî dikim. Hêjayî gotinê ye ku hunermend Kanî Alan ji bajarokê Şiyê- Navça Efrînê ye, û ji zû de li Qeraltiya Denîmarkê dijî.

Hezar pîrozî ji hunermendê Çiyayê Kurmênc-Efrîn, evîndarê dara zêtûnê Kanî Alan re. Hêviya me ew e ku di warên hunera xwe bigihê astên herî bilind û navê Kurd û Kurdistan bigihîne qadên navnetewî.

# Berê Civaka Kurdî Li Kû Ye?

**Vejîna Kurd**

Civakbûn mercê hebûna cinsê mirov e. Û tiştên ku civakê pêk tînin û wê dikin civakeke serbixwe ziman, dîrok, çand, ax û berjewendiyên hevpar in. Yanê ji her civakekê re çandeke taybet bi wê heye û ew bi wê çandê dibe civakeke cuda ji civakên din. Di vî warî de, rola her mirovekî di civaka xwe de heye, lê ji aliyekî din ve jî, civak nasname û kesayetiya mirov e. Ango her mirovek çanda xwe ji civaka xwe werdigre.

Weke ku hatiye zanîn, civaka kurdî ji hezar salan de, li ser xaka Mezopotamiyayê jiyana xwe berdewam dike. Li deşt, çiya, gelî û newalên wê, şaristaniya xwe ava kiriye û tevî ku Kurdistan ji aliyê dagîrkeran ve bûye bêdera parvekirinê, lê Kurdan ziman û reseniya civaka xwe bi şêwekî baş parastine, û li gor xweristiya civakbûna xwe jî, li ber pêlên guhartin û pişaftin rawestîne. Ma gelo çi hîştiye civaka kurdî li ser lingên xwe bimîne?!!

Di dirêjahiya dîrokê de baş xuyaye ku civaka kurdî kari bû her dem li ber xwe bide, herweha xwîn û giyanê xwe kiriye qurbana hebûna xwe. Ya ku civakekê li ser pêyan radiwestîne û wê ji pişaftinê diparêze berî her tiştî xak û nirxên netewî ne, kirdeyên wek sinc, hizirin, hezkirina xakê û hemû cureyên zargotinê ne. Di vî warî de, civaka kurdî ta astekê xwe parastiye. Belê.. ew civakeke pêşketî, xweragir û dewlemend e. Tevî ku para rastiyê di van tevahiyan de heye, lê em ji bîr nekin ku xaknîgariya Kurdistanê ya çiyayî di parastina civaka kurdî de roleke girîng lîstiye, û bandora neyînî ya civakên derdora xwe derbas nav



xwe nekiriye.

Rewşa ku niha civaka me ya kurdî tê re derbas dibe, rewşeke sawdar e, îro rêjeya koçberiyê bilindtir dibe û tirsa guhartinên civakî di nexşeya civaka Kurdî de bilind dibe. Pirsgirêka koçberiyê gihaye astekê ku civaka kurdî ji hin aliyên reseniya xwe were derxistin, ji ber ku koçberî û penabertî jihevkirinê di laşê civakê de peyda dikin. Kurd ji welatê xwe koçber dibin û li aliyê din jî, biyanî derbas civaka wan dibin û li şûn wan cih digirin. Dema civakek dest ji xaka xwe berde û endamên xwe radestî civakên biyanî bike, ne hêsan e ku ew mirovê penaber kanibe xwe û zarokên xwe ji çanda nû biparêze. Hatiye dupatkirin ku bi demê re ewê di wê civakê de werin pişafitin, ji ber ku, bingeha avakirina civakê xak û mirov e, û koçberî sedema rûxandina wê bingehê ye. Di vê qonaxa hestiyar de, pêdiviyeke mezin heye, ku ne tenê siyasetmedar û rewşenbîr, lê hemû kurdperwer ên mirovhez xwe bavêjin qada civaka xwe û ji êşa gelê xwe dûr neçin. Divê nifş bi bandorên vê pirsgirêkê agahdar bibe û hezkirina girêdana wî bi xakê ve di dilê wan de were vejenandin, divê ew bi kesayetiya civaka kurdî ve were girêdan. Bêguman, di vî warî de pêwistiya perwerdê pir pêdvî ye, û rola ronakbîran jî zor girîng e.

## Ênfilwenzeya Berazan-(H1N1)

**Bijişkê Newrozê**

Enfilwenze yan Girîp, ji nexweşiyên vegirok e. Ango gengazî heye ku ji mirovekî here yekî din û wî jî nexweş bike. Loma jî eger gihîşt malekê yan jî li dibistanan hate dîtin, piraniya endamên wê toşî Ênfilwenze dibin û pê nexwş jî dibin.

Sedema nexewaşiya Ênfilwenze ``vêrûs`` e. Sê cureyên vêrûsa Ênfilwenze ya normal hene (A, B, C). Sokina wan ya sereke tilûrên avî ne. Vêrûs di rûvikên wan de dijîn û di riya pîsiya wan re dikeve avê, û dema ku ew avê vedixwin dîsa vêrûsê werdigrin û herwiha gera wê digere, lê tilûr pê nexweş nabin, tenê gava vêrûs digihê mirov û mercên taybet jî jê re peyda dibin, ew hêgin dibe û mirov nexweş dike.

Nexweşiya Ênilwenze werzî[demsal] ye, ango bi piranî di werza zivistanê de tê. Ew kane bigihê hemî kesan û wan …….⓫

## Ênfilwenzeya… Dûmahîk

nexweş bike, lê bi taybetî zarok û kesên temen mezin zû pê dikevin. Bi tevahî, nexweşiya Ênfilwenze ya normal (A-HN) sivik û bê metirsî derbas dibe.

Lê carina guhertinên taybet di hundirê vêrûsa Ênfilwenzeya normal A-HN de çê dibin û curene nû têne afrandin, û gava ku ew cureyên nû digihên govdê mirov, nîşan û berjengine nû û metirsîdar li nexweş peyda dike. Ênfilwenze A-H1N1 ku bi navê ``Ênfilwenza Berazan`` jî tê nasîn, yek ji wan vêrûsên guhêzok e.

Bi tevahî, ji hêla şan û berjengan ve nexweşiya Ênfilwenza Berazan (H1N1) mîna Ênfilwenza normal e û zû ji ser hev cuda nabin, lê belê gava ku li ba nexweşekî pileya tînê pir bilind bû, mofirkên wî pir êşîn, nava wî çû û vereşî, sîng hate girtin û bêhnkişandina wî jî dijwar bû, wê hîngê gumana Ênfilwenze H1N1 çê dibe, wê hîngê gerek e nexweş li bijîşkê xwe vegere û tiştên pêwîst jê re bike.

Ji bo vê nexweşiyê û hemî nexweşiyê vegirdar, xweparastin mercê herî bingehîn e. Loma jî, gerek e her mirovek ji ber xwe û civaka xwe ve xwe berpirsiyar bibîne, li paqijiya xwe û derdora xwe miqate be, destê xwe berî xwerinê bi sabûnê bişo. Di rûyê kesekî de nekuxe. Tiştan ji ber devê hev venexin, mîna qehwa tal û H.W.D. Dema ku mirov nexweş bû jî, di mal de bimîne û neçe kar, dibistanê û H.W.D. Wê hîngê û bi wan tiştan ew xwe, malbata xwe û hemî kesên derdora xwe diparêze û zû jî çak dibe.




## Rol û Derfeta … Dûmahîk

hemû helwestên me di xizmet berjewendiyên Kurdan de bin û nakokiyên di nav xwe de çareser bikin. Bila berjewendiya gelê Kurd di ser ya partîtî û kesane re were girtin û ji hemûyan re bibe durişmeke sereke û bingehîn. Belê, bi vî awayî gelê me yê Kurd wê bi serkeve û mafên xwe yên netewî û demokratîk jî bistîne.

---

## Rêveberiya xweser … Dûmahîk

vê rêveberiyê wê li partiyê werin barkirin. Vêca, berî her tiştî divabû ev partiyên nêzîkî hev di bîr û baweriyan de, di kar û barên xwe de, li hev bipirsin û milê wan li milê hev be, da ku vê projê biparêzin, piştî ku (ENKS) ya mayî kete warekî xirab û xwe bi tevayî siparte aliyekî rêzanî. Tê xwestin ev her pênc partiyên (lêvegera siyasî) danûstandinek berfireh bi hemû layên siyasî, dezgehên çand û civakê, kesên serbixwe re bikin, da ku yekrêziyê bi awa û mercine nû damezrînin. Piştî pêkanîna rengek ji rengên yekrêziyê, hînga tev bi hev re rêveberiyek hevbeş û bi serûber biçespînin û bi rê ve bibin, çi li gor xalên rêkeftina Dihokê yan jî rêkeftinek din be.

---

## Danasîna Navên … Dûmahîk

**Geliyê Circim:**

Circim, navê beşê dawiyê ye ji Ge.Xastiya li navça Efrînê-Çiyayê Kurmênc, ew di navbera her du gundên Merwanê re derbas dibe, û di deşta Ĥemqê de winda dibe. Navê “Circim” di gelek jêderên dîrokî yên kevin de hatiye.

El-Bilazirî di pirtûka xwe /Fitûĥ El-Buldan/ de dibêje: ((Cercûmê bajarek e, li ser çiyayê El-Lêkam e… Ebû 'Ubeyde El-Cerraĥ ew li sal 637/Z vekiriye. Lê bi sedema ku şêniyê wê Fileh bû, û dilê wan bi Bîzentiyan re bû, Xelîfeya Umewî Welîd kurê Ebdilmelêk, birayê xwe Mislîme şand, ew bajara wêran kir, û şêniyê wê jî anî li deverên Çiyayên Ĥiwarê, Lûlûn, û Tîzîna Ĥemqê, û hinek jî li Ĥumsê bicih kirin…)). Wekî ku em dizanin, Çi.Ĥiwarê (Hawar) û Lûlûn (Lêlûn) jî du deverên Na.Efrînê ya niha ne.

Wekî ku hatiye zanînin, bajarê “Curcum yan Gurgum” bajarê Meraşê yê li Tirkiyê ye. Ew li hezarê yekê berî zayînê, navendeke gelê Hitîtî bû, û ra dema hatina Îslamê, şêniyê wê li ser ola Fileh û ji netew Hitît bû.

Li ser milê rojhilat ê geliyê Circim, li hember Gu.Hêkiçê, şikavlên warekî kevin hene, belkî ew ji cihên ku Cercûmiyên “Hitîtî” lê hati bûn bichkirin be. Wek me dît, eşkere ye ku navê “Circim” ji navê wan Circimiyên Arî û bajarê wan “Circim” hatiye birin.

# Pîrozbahî

Bi armanca rêzgirtin li zimanên hemî gelên cîhanê, çi piçûk û çi mezin, rêxistina UNESCO roja 21ê Sibatê ji her salê weke Cejna Zimanê Dayikê bi nav kiriye.


Li cîhana me ya îro, bêtir ji 4000 zimanên zindî hene, ew bi hev re dewlemendî û pirengiyê didine çand û wêjeya navnetewî, bi rêya wergerandinê, gelên cîhanê hev nas dikin, ji hev nêzîk dibin û ji ezmûnên hev fêr dibin û bi tevayî ew jiyana mirovahiyê dixemilînin. Lê mixabin ku ji ber merc û hoyên dijwar ku ew ziman tê re derbas dibin, gelek ji wan li ber windabûnê ne. Bê goman e, ku windabûna peyvekê ji zimanekî, yan straneke ji folklora miletekî, ji hemû gelên cîhanê re ziyan e.

Bi saya kar û xebata keç û lawên gelê me ji bo parastin û pêşvebirina zimanê Kurdî li ser bingeha xebata mezin û sembolên me yên mîna Xanî, Cezerî, Miqada Bedirxan, Ebdurehman Brdirxan, Celadet û Kamîran Bedirxan, Koyi, Cegerxwîn, Namî, Palo, Qenatê Kurdo, Erebê Şemo … û gelekên dîtir, zimanê Kurdî pêdarî kiriye, li ber xwe daye, û di hemû şerên dijwar ên winadakirina wî ku ji xwe re kiribûne armanc de bi ser ketiye, û roja îro, bi milyonan Kurd bi zimanê dayika xwe dixwînin, dinivîsin û pê fêr dibin.

Herweha, berî çend rojan, Rêveberiya Google wergerandina bi zimanê Kurdî (Tîpên Latînî) Fermî pejirandiye. Ev yek ji bo gelê Kurd û zimanê Kurdî serkeftineke mezin e.

Bi helkeftina Roja Cîhanî ya Zimanê dê, gelê kurd, hemû rewşenbîr, hezkerên zimanê Kurdî û hemû gelên cîhanê pîroz dikim û gurzek gul diyarî giyanê hemû xebatkarên zimanê Kurdî dikim.

## Pirtûkeke Nû!




Li destpêka miha Reşemehê[Sibatê] pirtûka kurteçêrokan a mamoste **Mihemed Qere Hesen** bi navê ((Debgvedana Xwînê)) li Eferînê derket. Mamoaste M.Qere Hesen ji penaberên bajarê Helebê, û niha li bajarê Efrînê rûdine û ji gundê xwe Memala –Reco jî dûrneketiye. Belkî wê loma jî, piraniya çêrokên pirtûkê di salên qeyrana Sûryê de hatin nivîsandin û mijarên wê datîne ber xwendevanan. Mamoste M.Qere Hesen helbestvan û çêrknivîs e, ew ji zû de bi zimanê kurdî mijûl dibe û pê dinivîse. Em westan spas dikin û berhema wî pîroz dikin û zor hêja ye ku ew çêrok werin xwendin..

## Reûf Şitlo.. Nivîskar û Parêzer



Li roja 25/02/ 2016an, parêzer û nivîskar Reûf Şitlo li Stembûlê temenê xwe dît û çû ber dilovaniya Xwedê. Mamost Reûf li sala 1930î li gundê Coqê-Efrînê ji dayîk bûye. Xwendina parêzeriyê li zanîngeha Şamê kuta kiriye. Li dema destlata infîsalê di dema leşkeriya xwe de bû dadwerê leşkerî li bajarê Qinêtirê, lê destpêka destalata Partiya Be`is li sala 1963an, ji ber ku ew Kurd bû, ew û gelek hevalên wî yên Kurd ên evser ji leşkeriyê hatin derkirin. Pişt re, wî demeke dirêj karê parêzeriyê li bajarê Helebê kir û di ber wê re derbas nava rewşenbîriyê jî bû, û sê roman nivîsandin û bû endamê Yekîtiya Nivîskarên Sûryê û xelatek ji şaxê wê yê bajarê Heleb wergirt. Dilovaniya Xwedê li mamoste Reûf Şitlo be, bila serê mal û malbata wî xweîş be.